isim listelerinin Bağdat'a gönderilmesi hususunda Irak Federal Hükümeti ile anlaşmaya varıldığını belirtti.

Irak Federal Hükümeti'nin Kürdistan Bölgesi'nde çalışanların mayıs ayına ait maaşlarının bir bölümünü gönderdiği belirtildi.

Süleymaniye'de Bahtiyari projesinin açılışını gerçekleştiren Kürdistan Bölgesi Başbakan Yardımcısı Kubad Talabani, gazetecilere açıklamalarda bulundu. Bağdat'ın Peşmerge ve güvenlik güçlerinin mayıs ayına dair maaşlarının gecikmesine ilişkin sorulara cevap veren Talabani, "Mayıs maaşının bir kısmı geldi" dedi.

Peşmerge ve güvenlik güçlerinin listelerinin Bağdat'a gönderilmesi konusunda Irak Federal Hükümeti ile anlaşmaya varıldığı bilgisini veren Talabani, hiçbir kamu personelinin hakkının kaybolmayacağını ifade etti.

Mayıs ayı maaşının bir kısmının geldi ve yakın zamanda dağıtılacak diyen Talabani, "İsim listesinin Bağdat'a gönderilmesi konusunda belli bir anlaşmaya varıldı. Bugün olmazsa da yarın heyetler arası bir görüşme yapılacaktır. Buradan olumlu kararlar çıkacağını düşünüyorum. Hiç kimse hak kaybına uğramayacak" ifadelerini kullandı. "Kürdistan'daki çalışanların nisan ve mayıs ayı maaşları bayramdan önce ödenecek mi" sorusuna Talabani, "Mayıs ayı maaşının bir kısmı ulaştı. Diğer kısımların gönderilmesiyle birlikte herkes maaşını alacaktır" diye yanıtladı.

Kürdistan Bölgesi'nde üretilen petrolün dünya piyasalarına sunulması konusundaki krize de değinen Talabani, "Kürdistan Bölgesi yönetiminden bir heyet petrol konusunu görüşmek üzere Bağdat'a gidecek. İnşallah güzel sonuçlar alınacaktır" diye konuştu. Bölgede olan ekonomik kriz başta olmak üzere siyasi, toplumsal tüm sorunların çözümünü içi uğraştıklarını vurgulayan Başbakan Yardımcısı Qubat Talabani, "Çalışmalarımız bir kent için değil. Sadece Erbil, Duhok ve Süleymaniye değil tüm il ve ilçelerimizin kalkınması ve gelişmesi gerekiyor" ifadelerini kullandı.

Serok Barzanî û şanda Wezareta Derve ya Îranê tekezî li ser pêşxistina peywendiyên kirin



Serok Mesûd Barzanî iro Ina 14.06.2024 li Selaheddîn pêşwaziya Serpereştyarê Wezareta Derve ya Îranê kir û di wê hevdîtîne de herdu aliyên tekezî li ser pêşxistina peywendiyên kirin. Di hevdîtîne de rewşa siyasî ya

navçeyê û Iraqê guftûgo kirin û tekezî li ser pêşxistina peywendî û dostayetiya di navbera Herêma Kurdistan û Komara Îslamî ya Îranê, taybet li warên aborî û bazirganî û kultûrî kirin.

Her di vê hevdîtîne de Serpereştyarê Wezareta Derve ya Îranê rûmet û pêzanînen xwe ji bo helwesta Herêma Kurdistanê ya li ser rûdana ketinaxwarê ya helikopterê û can jidestdana Serok Komarê Îranê û şanda pê re hebû.

Her wiha spasiya welatê xwe ya ji bo şandina şanda taybetî ya Herêma Kurdistanê ya ji bo beşdarîkirina li pirseya can ji destdana Serok Komarê Îranê û şanda pê re bi Serok Barzanî gihand.

Nêçîrvan Barzanî û konsulê nû yê Tirkîyeyê civiyan

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Konsulê Giştî yê yê Tirkîyeyê yê Herê-



ma Kurdistanê civiyan û Barzanî piştgiyîya xwe ji bo konsulê nû yê Tirkîyeyê nişan da.


Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî iro li Hewlêrê Konsulê Giştî yê Tirkîyeyê yê Herêma Kurdistanê Erman Topçu pêşwazî kir ku nû dest bi kar kiriye.

Nêçîrvan Barzanî bixêrhatina Erman Topçu kir û piştgiyîya xwe ji bo wî nişan da.

Erman Topçu jî dilxweşiya xwe ji bo destpêkirina karê xwe yê nû diyar kir û hêvî xwest ku di çarçoveya erkê xwe de bikare pêwendiyên dualî zêdetir pêş bixe.

Herwiha her du aliyên rewşa Iraqê û Herêma Kurdistanê û herêmê bi awayekî giştî gotûbêj kirin. Erman Topçu 27ê Gulana 2024an wekî konsulê giştî yê Tirkîyeyê yê Herêma Kurdistanê li şûna Mevlut Yakut dest bi kar kiribû.

Mesrûr Barzanî pêşwaziya Birêvebera Ofîsa Herêmatîyê ya Sindoqa NYê kir



Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya Birêvebera Ofîsa Herêmatîyê ya Sindoqa Neteweyên Yekbûyî ya Şêniyan kir û di civînekê de tekez kir ku pêdivî ye serhijmêrî tenê ji bo hizra pêş-

Neteweyên Yekbûyî ya Şêniyan Welatên Erebi Leyla Bekir kir.

Di wê civîne de, danûstandin li ser kar û piroje û çalakiyên Sindoqa Neteweyên Yekbûyî ya Şêniyan li Iraqê û Herêma Kurdistanê di warên pêşxistina şiyânê bicihanîna amar û serhijmêriya şêniyan de hatin kirin, xasma ku biryar e di Mijdara Îsal de serhijmêriya giştî li Iraqê bê kirin.

Pêşxistina alîkarî û hevahengiyên navbera aliyên peywendîdar ên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federalî li gel Sindoqa NY ya Şêniyan re hat tekez kirin, pêxemetî biserxistina piroseya serhijmêriyê ku pêdivî ye tenê ji bo merema pêşxistina şêniyan be û bi awayekî dadperwerane û dûrî her armanceke siyasî bê kirin.

Erebkirina Kerkûkê gihiştîye asteke metirsîdar

Proseya erebkirina Kerkûkê gihiştîye asteke metirsîdar û bi dehan belgeyên erebkirîne û anîna



erebên bajarên din ên Iraqê bo navenda Kerkûk û derdora wê hatine eşkerekirin. Hewldanên guhertina demografiya bajarê Kerkûkê piştî 16ê Cotmeha 2017ê gihiştîye asteke metirsîdar û bandor li ser paşeroja bajêr kiriye û bûye metirsî li birîna Kerkûkê ji nasnameya xwe ya Kurdistanî. Ev di demekê de ye biryar e proseya serjimêriya giştî ya nifûs û xaniyan di Mijdara bê de were kirin. Li gorî belgeyan, erebkirina Kerkûkê di 7 salên borî de di serdema desthilata Rakan Cibûrî de, ji erebkirina rejîma berê ya Iraqê zêdetir hatiye kirin, veguheztina nasnameyan, formên xwarinê, piştgiyîya xaniyan, tayînkirin û dabeşkirina zeviyan, rê û rêbazên herî berbelav ên erebkirina Kerkûkê ne. Berpirsê Ofîsa Kerkûkê ya Desteya Navçeyên Kurdistanî yê Derveyî Îdareya Herêma Kurdistanê Karwan Kemexan dibêje, ji 16ê Cotmehê ve erebkirina Kerkûkê berdewam e, wek mînak di hefteya yekem a piştî bûyerên 16ê Cotmehê de, malbatên Erebi ji deverên din anîn û li Kerkûkê bicih kirin. Herwiha nasname, formên xwarinê û kartên niştecihbûnê ji wan re hatine dayîn, ku ev jî pir xeternak e.

Ev pilana erebkirina di demekê de ye, biryar e Iraq di meha Mijdara Îsal de serjimêriya giştî pêk bîne, ji ber bandora wê li ser paşeroja kurdên Kerkûkê jî, Kurd wê serjimêriyê red dikin. Ji aliyê xwe ve, Cîgirê Serokê Parlamentoya Iraqê Şaxewan Ebdullah jî ragihand, di rewşa niha de em encamên serjimêriyê red dikin û nas nakin. Nabe serjimêrî li Kerkûkê bê kirin, ger tê xwestin ku prose li Kerkûkê were kirin, divê li gorî hin pîvanan were kirin. Ji bilî van pîvanan, em ê li Kerkûkê ti serjimêriyê nas nekin û weke serjimêriya 1977 û 1997'an lê binêrin. Me ji Erebi û Tirkmenan re gotiye, yan divê serjimêrî li Kerkûkê neyê kirin yan jî bi mekanîzmaya ku em dixwazin were kirin, eger nebe em wê nas nekin." Tedbîrên niştecihkirina Erebiên hawerde li Kerkûkê û navçeyên Kurdistanî yê derveyî Îdareya Herêma Kurdistanê û serjimêrî, li dijî madeya 140 a destûra Iraqê ye.

Li gorî belge û amaran, ji 16ê Cotmehê ve zêdetir 100 hezar malbatên Erebi ji bajarên din anîne Kerkûkê, bi vê pêngavê jî erebkirina wî bajarî ketiye qonaxeke metirsîdar û di vê rewşê de pêkanîna serjimêrî dê ziyane bighîne kurdan.

Mihemed Îsmâil: Her behsa diyaloga Kurdî-Kurdî tê kirin, PYD kiryarên xwe li dijî ENKSê gur dike

Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê - Sûriye (PDK-S) Mihemed Îsmâil got jî: "Ev kesên ku



Îsmâil, "Her dema behsa diyaloga Kurdî-Kurdî tê kirin, PYD kiryarên xwe li hember ENKS û partiyan wê gur dike, ji ber ku ew ji diyalogê ditirse û yekrêziya Kurdî naxwaze." Sekreterê PDK-Sê Mihemed Îsmâil li ser pîrsa revandina endam û çalakvanên ENKSê ji ajansa K24ê re got: "Hilmeta girtina endamên ENKS û PDK-Sê berdewam e, ji ber ku PYDê bi qasî ku metirsiya wê ji ENKS û PDK-Sê heye, ji ti aliyekî din tune ye, ji ber ku baweriya miletê me bi ENKSê heye û eger ew derfetê bide ENKSê, dê ew ê nemîne. Ji ber vê jî PYD hilmet li ser hilmetê û hemû gef û binbêkirinan li hember ENKSê û alîgirên pêk tîne, endamên wê direvîne û ofîsên wê di-

witîne."

Mihemed Îsmâil got jî: "Ev kesên ku

têne revandin, xebat û welatparêz in û ji malbatên ku bi helwestên xwe ya welatparêz û niştimanperwer naskirî ne, ji ber wê jî ew niha rastî girtin û gefxwarinê tîne û ew çekdarên ku bi ser malên wan de digirin jî, piraniya wan endamên partiya Beis bûn û niha derfet ketiya wan ku tola li xebatkarên welatparêz hilînin." Da zanî jî: "Bi van êrîşên li ser ENKSê, ji civaka Kurdî û raya girtî re tê tekezîkirin ku ENKS xwedîya projeya netewî ya Kurdî ye û nûnera rasteqîn a doza gelê Kurd a li ser asta navdewletî û hemû astên ku bi pêşeroja Sûriyeyê re pêwendîdar e."


Tekezî li ser wê yekê jî kir, "Xebata me berdewam e û ev kiryarên tirsonek

dê me ji rêya xebat û têkoşîne dernexîne. Eger me serê xwe li hember rejîma xwe top, tank û firoke re danên, em ti carî serê xwe li hember dûvelankên wê natewîn. Em bi baweriya xelk û miletê me û piştevaniya wan dê xebat û têkoşîna her berdewam be." Sekreterê PDK-Sê amaje bi revandina rojnamevan Bêrîvan Îsmâil ji aliyê çekdarên PYDê ve kir û got: "Girtina Bêrîvan Îsmâil rûmetek e ji wê û malbata wê ya xebatkar û welatparêz e û lekeyeke reş e li eniya kesên ku ew girtine ye. PYD her dem behsa jinê û mafê wê dike, lê ew tenê jinê ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne."

Da zanî jî, wan hevpeymanîya Navdewletî, aliyên pêwendîdar yê Ewropî, rêxistinên mafên mirovan û raya giştî ya Kurdî bi van kiryan û tengaviya li ser gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê di warên ewlehî, aborî û hemû waran de, agahdar kirine û got jî: "Em ê dest bi çalakiyan bikin, ji bo redkirina van kiryan xirap"

Mihemed Îsmâil amaje bi wê jî kir, her dema aliyê Amerîkî behsa diyaloga Kurdî-Kurdî dike, PYD kiryarên xwe li dijî ENKSê gur dike, endamên wê digire û ofîsên wê dişewitîne, ji ber ku ew ji diyalogê ditirse û naxwazin yekrêziya Kurdî çêbibe.

Ezbenî! Em Bendewarên Şadiyê Ne!



Konê Reş

Ezbenî! Çima şadî di rê de winda dibe?! Navnîşanên ku ji mêj ve, me di kolan û çardiryanên welatê xwe de danîne rastin; Çira û Xetîr veketîne.. Derî û pencere vekirîne.. Cil û bergên nû li me ne.. Û baş box û beranên me hatine serjêkirin..!

Mixabin! Çavên me qerimîn û şadî ne hat..! Ne me ew ji bîr kir û ne ew winda dibe.. û wiha em di

welatê xwe de, di nav êş, jan û sirgûnkirinê de, çavnêrên wê ne.. Her ku deriyek vedibe, em dibêjin; belkî şadî têre derbas bibê! Her ku mûmek vêdikeve, em bi hêvî dibin ku li ber ronahiya wê şadiyê bibînin.. Lê sed mixabin! Gelek sal derbas bûn û me ew şadî nadît.. Tevî wilo jî, em çavnêriya wê dikin..! Û bi hêvî ne ku bi serbestê bi zimanê bav û kalên xwe bikenin û bigirîn.. Bê tirs çîroka (Memê Alan, Siyabend û Xecê û Derwêşê Evdî), Ji zarokên xwe re bêjin û wek netewekî azad, xwe di nav civaka netewên dinyayê de bibînin..Erê her em ê bendewarê şadiya welatê xwe bin. Belê ezbenî! Ku ez û te zimanê xwe, dîroka xwe û navdarên xwe nas nekim, em ê çilo xwe bi xelkên dinyê bidim naskirin?

Ezbenî! Nîşe, feylesofê Almanî bingehê felsefeya xwe li ser du hîmenên ku di hundirê mirov de diçing û tîna kiriye. Yek jê,

belû û eşkere ye, ya din nepen û veşartî ye.. Di bawerîya min de Orhan Pamuk jî di nivîsên xwe de li gor felsefeya Nîşe liviya ye, ta ku wî xelata Nobel wergirtiye. Ew di hundirê qehremanên romanên xwe de, li wan tiştên veşartî gerya ye.. Belû ye tiştên diyar her kes bi wan zan e, lê ez heyranî wî mirovî bim yê ku karibe wan tiştên ne diyar, bi hunereke bedew û bawerî diyar bike.. Erê ezbenî wek ku kurdan gotiye; "Bi xweziya kesî ranehiştîye baqê keziya".

* * *

Ezbenî! Nikarim bi her kesî re bikenim.. Bi her kesî re bigrîm..! Dixwazim normal bijîm, rojên xwe wek rojên her çar demsalên salê derbas bikim: Zivistanê; xwe ji şîpên berfa çiyayê Toros û zagros biparêzim.. Buharê; bi çûk û çivîkên welatê xwe re bifirim.. Havînê; bi roka welatê xwe re bikenim û Payîzê; sapê jiyana xwe, li Beriya Mêrdînê, ser benderên Doda bidêrim û bidêrim..

Serhildana Şêx Übeydullah Nehrî

Beriya qal û behsa Serhildana Übeydullah Nehrî divê em ser serpehatiyên destpêka sedsala 19mîn bisekinin. Dewleta Osmanî êdî ne wek berê bû. Ew hêz, quwet û îhtîşama sedsalên 16, 17 û 18an nemabûn, kevirek ji hîmê dewletê hatibû kişandin û dewlet serserî ber bi jihevçûnê diçû. Alîkî ve aloziyeke mezin xwe sikura împaratoriye ve alandibû, aliyê din ve jî Dewletên Ewropî roj bi roj heq û mafên nû bo Ermenî û Nasraniyan dixwestin. Osmanî bégav mabûn, ketibûn pey çareseriyên nû. 1839a de Tanzîmat yanî pergala û sazûmana nû hatibû îflankirin. Wê pergale sistemeke teze bi xwe re anîbû hole. Angora wê sistemê hemû herêmên bin împaratoriye bi paytext ve hatibûn girêdan, mîrekî hatibûn rakirin û êdî soz li paytext ji dev derdiket, mor li paytext dihat lîxistin û biryar li paytext dihat hildan.

Pêjirandina Tanzîmatê ne tiştê hêsan bû bo Kurda û encamê de serhildan dest pê kirin. Çar sal pey îlana Tanzîmatê re yanî 1843an de Mîr Bedirxan serî hilda û ev rapêrîn heta 1847 dom kir. Di wê serhildanê de Kurd têkçûn û Osmaniya herêm hildan bin kontrola xwe. Sala 1853a de Şerê Üris û Osmanî derdikeve, lêbelê Kurd piştigiriyê nadin Osmaniya jiber ku bi têkçûna Bedirxaniyan re Kurd ji Osmaniya sar bûn, dûr ketin.

Heyşt sal dî Mîr Bedirxan, Yezdansêr sala 1855an de serî hildide. Kurdên rojhilat, rojava, bakûr û başûr tîna alikariyê û ordiyekî mezin tînin pê. Osmanî nikarin agirê hatiyê vêxistin bitemirînin, serî dernaxin û alikariyê ji konsolosê Îngilizî yê li Mûsilê dixwazin. Şehbenderê Îngiliz, dewletê û Yezdansêr li hev tîne, aşitî çêdibe.

Bi xilasbûna mîrekiyan re li Kurdistanê tu duzen û pergala namîne. Serokên eşîreta guhê xwe nadin tu qanûn û zagona. Dizî, destdirêjahî, kuştin, wêran û talan zêde dibe. Di wê hengam û aloziyê de şêx û melayên terîqeta dewsa mîr û mîrekiyan digirin. Dibin xwediye qedir û qîmeteke bilind û eşîretên heremê xwe davêjin bin baskê şêxan. Sedsala 19emîn de terîqeta herî xwedî tesîr û bandor Terîqeta Neqşî bû. Şêx Übeydullah Nehrî serok û mezinê Neqşibendiyan bû. Nehrî ji herçar perçên Kurdistanê jî baş dihat naskirin. Dema Şêx Nehrî de, Kurdên belavbûyî tîna ser hev, yekîtiyê tînin holê.

Şerê Osmanî û Üris yê salên 1877-87 de Şêx Nehrî xwe dide aliyê Osmaniyan. Paytext ji Nehrî re 20 hezar tîngên Martîni dişîne ku Şêx dijberî Üris bikeve herbê. Lê anegorê peymanê divê Kurda ew silahana dî şer re radest bikarana. Leşkerên Nehrî tîngên Osmanî xwe re tînin Kurdistanê û salek pey re yanî sala 1879 an de dijberî Osmaniyan dest bi haziriya serhildanê dikin.

Li vir divê em bipirsîn ka çima salek berê alîkarî dan Dewleta Osmanî û salek pey re xwestin dewletê re bikevin şer. Sedema wê rapêrînê, fikra çêbûna Dewleta Ermeniyan e. Konsolosê Îngilizî di sala 1879an diçe Wanê û tîna gotin ku bi destê Îngiliz Dewleteke Ermenî yê li Kurdistanê were avakirin. Pey van gotegot û rîwayetan Kurd civînan pêk tînin û encamê de biryara cengê tîna hildan. Lê ev ceng dijberî Osmaniyan nîne, ev dijberî Îranê ye. Şêx Nehrî xwediye teknîk û taktîka bû. Osmanî û Îranî anîna ber hev, miqayese kir û dît ku rewşa Îraniyan nebaş e jiber ku Îranî wê demê ji Efganan re boy bajarê Heratê ketibûn

herbê. Şêx Nehrî dît ku avakirina Kurdistana Îranê hêsan e. Pêşiyê li rojhilat dewletê were çêkirin û ew dewlet ê Osmaniyan re bikeve şer.

Beriya dest pê kirina êrîşan, Nehrî sedemên wî şerî yek bi yek rêz kir;

Dewleta Faris Kurda qetîl dike
Bi darê zorê ji eşîretan pere tîna standin
Jinên Kurd ji aliyên leşkerên Îranî tîna revandin
Farisên şîî zilmê li sunniyan dikin
Dewlet baceke gelek zêde ji Kurdan distîne û Kurd êdî bêzar bûne

Şêx xeberê ji serokê eşîreta Mangûr re dişîne ku agirê serhildanê were vêxistin. Serok Hemzê Mangûrî dest bi rapêrînê dike û Şêx Nehrî 1000 leşker bo alîkariyê jê re dişîne.

Hedefa Hemzê Mangûrî Tebrîz û Mehabad e, hedefa Mîr




Sadiq Ürmiye ye, hedefa Mihemed Seyidê Biradostî Xoy û Rojavaya Ürmiyê ye. Ew cîhên azad dibin, hukumet tîna avakirin. Rojên Înê xutbe tîna xandin. Di wan xutba de derheq miletê Şîî û cîmaetên din gotinên xirab tîna gotin. Bi dî wan xutba re miletên ne sunnî ji Kurdan dîra dikevin û tu piştigiriyê nadin Kurmanca. Alîkî ve jî Osmaniyan sînor girtibûn, Kurdên Bakûrê nikaribûn herin alîkariya birayên xwe. Di dawiyê de Şêx Nehrî para ve vekîşîya, derbasî herêma Biradost bû.

Bi hatina Şêx ve, ew Kurdên li Îranê destê Faris revîn û xwe avêtin sînorê Dewleta Osmanî. Bi hatina wan re Kurd Osmaniyan re bûn xetere û tehlûke. Dewleta Osmanî zanibû ku Nehrî weha nasekinê yê dîsa serî hilde. Padişah Ewdilhemîdê duyemîn, Şêx Nehrî dawetê Stenbolê dike. Dema Nehrî xwe digîhîne Paytext gellek baş tîna pêşwazî kirin û pey re jî Nehrî tîna derdixe ku destê Osmanî de hêşîr e. Şêx Übeydullah Nehrî ji Stenbolê direve û bi keştiya Fransîzan derbasî Rojavaya Kurdistanê dibê û pey re xwe digîhîne Colemêrgê. Nehrî û kurê wî, Ewdilqadir, xwe bo şerêkî nû amade dikin. Lê ew demeke wisane ku ne Îngiliz, ne Îran û ne jî Üris dewleteke Kurd li Rojhilata Navîn de dixwazin. Encamê de Übeydullah Nehrî sirgûnê Mûsilê bû û dîra re şandin Mekkeyê. Li Mekkeyê sala 1883 an de çû rehma Xwedê.

Riataza

Nêçîrvan Barzanî bi Fermandarê Giştî yê Hêzên Hevpeymanan civiya

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro 13ê Hezîranê pêşwazî li Fer-



mandarê Giştî yê Hêzên Hevpeymanan li Iraq û Sûriyeyê General Joel Vaul û şanda pê re kir. Li gorî daxuyaniya Serokatiya Herêma Kurdistanê, di civînê de rewşa ewlehî, metirsiya terorê û gefên DAIŞê li ser ewlehî û aramiya Iraq û Sûriyê hat gotûbêj kirin. Herwiha tekezî li ser berde-wamiya hevkarî û hevahengiya di navbera hêzên Pêşmerge, artêşa Iraqê û hêzên hevpeymanan de hate kirin. Di mijareke din a hevdîtîne de ku Wezîrê Karûbarên Pêşmerge û Supasalarê Pêşmerge amade bûn, tekezî li ser serxistina proseya çak-saziyê li Wezareta Pêşmerge û yekkirina Pêşmerge hat kirin. Di vê derbarê de, her du alî li ser giringiya piştewaniya proseyê û nehîştina astengiyên hevneîn bûn.

Herwiha rewşa navçeyê bi giştî û çendîna mijarên cihê giringiya her du aliyan, aliyekî din ê hevdîtîne bû.

Fuad Husên: Me bi Elî Baqîrî re behsa pêşxistina peywendiyên siyasî, ewlehî û aborî kir

Wezîrê Derve yê Iraqê ragihand: "Me ligel Serperîştê Wezareta Derve ya Îranê li ser



pêşxistina peywendiyên siyasî, ewlekarî û aborî gotûbêj kir.

Wezîrê Derve yê Iraqê Fuad Husên îro di konfiraseke rojnamevanî ya hevbeş de got: Serdana şanda pilebilind a Iraqê bo Tehranê û beşdariya wan di merasima sersaxiya Serokkomarê Îranê de, bihêzbûna peywendiyên Iraq û Îranê nîşan dide.


Fuad Husên wiha got: "Em li bendê bûn ku Serokkomarê Îranê Îbrahîm Raîsî û Wezîrê Derve Husên Emîr Ebdullahiyan serdana me bikin, lê qedere rê neda."

Wezîrê Derve yê Iraqê aşker kir: "Me li ser pêşxistina peywendiyên siyasî, ewlekarî û aborî ligel Serperîştê Wezareta Derve ya Îranê gotûbêj kirin." Herwaha got: "Me li ser kêşeyên li herêmê gotûbêj kirin û li ser wê yekê em hevneîn in ku rewşa herêmê û asayîkirina kêşeyan li herêmê, pêwîstiya wan bi diyalog û şewîrîna berde-wam heye."

Fuad Husên derbarê agirbesta li Xezzeyê de got: "Em helwesta xwe dubare dikin û piştigirî didin agirbesta li Xezzeyê. Berfirekîrîna qada şer û metirsiya Îsraîlê ya li ser başûrê Libnanê metirsîdar e ji ber ku wê wêraniyê zêdetir bike."

Serperîştê Wezareta Derve ya Îranê Elî Baqîrî Kanî îro 13ê Hezîran bi serdanekê gihîşt Bexdayê. Herwiha biryar e serdana Herêma Kurdistanê jî bike û li gel berpîrsên pilebilind bicive.

Nêçîrvan Barzanî: Îran cîranekî girîng e



Nêçîrvan Barzanî got, "Îran welatekî girîng û cîranekî girîng e."

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Wekilê Wezîrê Karên Derve yê Îranê Elî Baqîrî li Hewlêrê li hev rûniştin. Serokatiya Herêma Kurdistanê da zanîn ku Barzanî û Elî Baqîrî li ser girîngiya pêwendiyên Îranê yên bi Îraq û Herêma Kurdistanê axivîne û wan diyar kiriye ku divê pêwendî li gorî

hîmê "cîrantiya baş" bin.

Her du aliyên aniyê zimên ku ew dixwazin hemû pêwendî û bi taybetî jî pêwendiyên aborî û bazirganiyê bi pêş bikevin. Dema Îranî ji bo ziyaretkirina cihên pîroz diçin Îraqê, Herêma Kurdistanê di deriyên sînorî re karên wan hêsan dike. Elî Baqîrî diyar kir ku Îran ji bo vê yekê spasdarê Herêma Kurdistanê ye.

Nêçîrvan Barzanî jî bal kişand

ser pêwendiyên baş ên bi Îranê re û ji bo alikariyên ku dide Îraq û Herêma Kurdistanê spasiya Îranê kir.

"Îran cîranekî girîng e"

Serokatiya Herêma Kurdistanê amaje bi "pêwendiyên dîrokî" kir û got, "Îran welatekî girîng û cîranekî girîng e."

Li hêla din, "rewşa giştî ya herêmê" û çend mijarên din jî hatine nixandîn.

Serokatiya Herêma Kurdistanê daxuyand ku hinek rayedarên Herêma Kurdistanê jî beşdarî civînê bûne.

Wekilê Wezîrê Karên Derve yê Îranê Elî Baqîrî îro hat Hewlêrê.

Elî Baqîrî li Balafirgeha Navneteweyî ya Hewlêrê ji aliyê Wezîrê Karên Navxwe Rêber Ehmed, Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê Fewzî Herîrî, Berpîrsê Ofîsa Pêwendiyên Derve Sefîn Dizeyî, Parêzgarê Hewlêrê Umêd Xoşnaw û gelek berpîrsên din ve hat pêşwazîkirin.

Elî Baqîrî destpêkê bi Serokwezîr Mesrûr Barzanî re hevdişînek kir.

Mesrûr Barzanî: Em hemî bizavan dikin ku bazarekî zêdetir bo berhemên navxweyî bê peyda kirin

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê berê binyatî yê pirojeya Bazarê Fêqî û Zerzewatî yê Hevçerx li Akrê dana. Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro



(Sêşem, 11.06.2024) berê binyatî yê pirojeya Bazarê Fêqî û Zerzewatî yê Hevçerx li Akrê dana û gotarek pêşkêş kir. Ev jî tekista gotara Serokwezîr Mesrûr Barzanî ye:

Amadebûyîyên hêja û berkeftî, spas ji bo amadebûna we û hûn gelek bixêr bîn, mandî nebin, spêda we bixêr. Cihê dilxweşiyê ku em dibînin her rojekê li cihekê Kurdistanê berê binyatî yê pirojeyekî tê danan an jî pirojeyekî tê bicihanîn û pêşkeftin li Kurdistanê berdeham e.

Ez dilxweş im ku careke din hatime devera Akrê û Berdereşê û em ji bo danana bernê binyatî yê pirojeyekî girîng ku pirojeyê bazarê hevçerx ê fêqî û elweyê ye li qezaya Akrê ne. Akrê yek ji kevintirîn bajarên Kurdistanê û yek ji kevintirîn qezayên Kurdistanê û Îraqê ye û dîroke gelek dêrî hêye û ji aliyê cografî û aborî ve devera gelek girîng û zengîn e, xasma di biyavê çandinê de. Ji aliyê geştyariyê jî ve, Akrê devera gelek girîng e û gelek cihên geştyarî lê hene û pilana hikûmeta me ew e ku di van her du waran de vê deverê zêdetir pêş bixe û derfetên karî peyda bike.

Berî ez bihêmin vê derê, min serdana hin cotyaran li nav zeviya çandîna petatan kir û ez bi hejmareke wan cotyaran re axivîm û min guhdariya wan kir. Cihê dilxweşiyê ku em dibînin berhemê petatan li Kurdistanê roj bi roj zêde dibe, gelek zêdetir ji pêdivîtiya navxweyî niha li Kurdistanê petatên berhemên navxweyî û awayê çandinê jî ber bi awayekî zanistî yê pêşkeftî ve diçe.

Ev berhem ne tenê tîra Kurdistanê belkî tîra hemî Îraqê jî dike. Pêngavên pêdivî jî ji bo hinardekirina berhemê petatên xwemalî yên Kurdistanê ji bo derveyê welatî hatine avêtin. Diyar e daxwazê zêde jî li ser wan heye.

Di çarçoveya bernameya hemerengkirina dahatên Kurdistanê de, me wekî Hikûmeta Herêma Kurdistanê gelek pûte û girîngî bi mijara çandinê li Kurdistanê daye û me di çaksaziya çandinê li Kurdistanê de dest bi şoreşekê kiriye, lê ev destpêk e û hêştê gelek pêngav mane ku me pê çê bibe kertê çandinê li Kurdistanê bigehînin astekî standard ê cihanî, ku ne tenê mifayî li xelkê deverê û cotyaran bike belkî ji bo hemî Îraqê û deverê jî bibe sebata xwarinê. Her-

wesa ev dê rêxweşker be ku di kertê pişesaziyê de jî ji bo çêkirina kargehan pêngav bîn avêtin û derfetên karî di van delîvyan de jî zêdetir bîn peyda kirin.

Dem a ez bi wan cotyaran re axivîm, wan hin gazin hebûn. Yek ji gazinên wan ew bû ku berhemê petatan yê derve li hin sinoran derbazî nav Herêma Kurdistanê tê kirin ku bandoreke nerênî li ser berhemê navxweyî yê cotyaran heye. Em wekî hikûmetê dê lidûçûnê jî bo vî mijarê bikin. Wezîra Çandinê Rêzdar Bêger jî li vê derê ye. Em dê li gel Wezareta Darayî lidûçûnê bikin, ku ew berhemên li nav Herêma Kurdistanê tîna berhemên, em rêyê nedin ew berhem ji derve bîn derbazînin, ji bo ku piştevaniya cotyaran berdeham be. Eger em bibînin ku bi awayên neqanûnî ev kar tê kirin, rêkarên pêdivî jî dê li bernaberî van tiştan bîn bicihanîn. Ji aliyekî din ve daxwaza wan cotyaran ew bû ku mijara av û bendavan jê re bê çarekirin. Her di bernameya hikûmetê de ye ku em çend bendavên din jî çê bikin, yek ji wan jî bendava Îsmavayê li Bakirmanê ye ku dê gelek mifayî li cotyaran Deştê Navkurê bike û dê berhemê wan zeviyên gelek bi xêr û bereket zêdetir bike. Her di bernameya Hikûmeta Herêma Kurdistanê de û di çarçoveya girîngîdana bi hemî deverên Kurdistanê de, me girîngiyê zêde bi sinorê Akrê daye. Li sinorê Akrê çend piroje di warên rêyan û av û karebê û çêkirina dibistan û yarîgehan û Zanîngeha Akrê de hatine bicihanîn.

Welatîyên xweşevî pêdivî zêdetir xizmetê ne û bi pişrastî ve li paşerojê dê gelek pirojeyên din jî ji wan re bîn bicihanîn. Armanca me ya serekî pîrrengkirina abor û çavkaniyên dahatan û vekirina jêrxaneyêke bihêz e, girîngîdana û pêşxistina kertê çandinê yek bûye ji wan karên ku heta niha me kirine.


Ji bo vê meremê me bi hevkarî bi kertê taybet re dest bi bicihanîna çend pirojeyên girîng kiriye, wekî çêkirina çend deverên pişesaziya xwarinê û berbazarkirina genimê Herêma Kurdistanê û hinardekirina berhemên cotyaran me ji bo bazarên derve. Me çend bendavên cuda cuda li deverên cuda cuda çê kirine ku ji bo berhemên xwemalî û cotyaran bûne piştevan. Herwekî min behs kir, di bernameya me de heye û em bi Hikûmeta Federalî re ji bo destpêkirina çêkirina bendava Îsmavayê jî axivîne.

Devera Akrê bi gelek berhemên çandinê navdar e, wekî birinc û petat û tehî û simaqê. Me hin ji wan li vê derê jî dîtin. Bê goman em dê alikariya wan bikin ji bo ku ew berhem ji bo derve jî bîn hinardekirin, ez haydar im ku hinardekirina hin ji wan berhemên ji bo derve hatiye destpêkirin jî. Em dê hemî bizavên xwe bikin ku bazarekî zêdetir ji bo berhemên navxweyî ji bo hemî cotyaran Kurdistanê bê peyda kirin. Ez dubare destxweşiyê li kompaniya bicihanîna dikim ji bo vê pirojeya girîng, û pêdivî ye li ser astê standardên navdewletî be. Ez li wê bawerê me ku ev piroje dê piştevanîyê zêde ji bo cotyaran peyda bike û avakirina vî bazarî dê bibe piştevanîyê ji bo pêşvebirina kertê çandinê li ser astê Kurdistanê.

Careke din li me û we hemiyên pîroz be û her di xêr û xweşiyê de bîmînin û Kurdistanê jî her avedan be.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwazî li Konsulê Giştî yê nû yê Tirkiyeyê kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 10ê Hezîranê pêşwazî li Konsulê



Giştî yê nû yê Tirkiyeyê li Herêma Kurdistanê Erman Topçu kir.

Li gor daxuyaniya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, Serokwezîr Mesrûr Barzanî ji bilî pîrozbajiyê li destbikarbûna wî, tekezî li ser pêşxistina peywendiyên dualî li ser bingeha berjewendiyên hevbeş kir. Serokwezîr Mesrûr Barzanî behsa girîngiya cibicîkirina projeya Rêya Geşepêdanê kir ku Iraq, Tirkiye û Ewropayê bi rêya hesinî bi hev ve girê dide. Herwiha amaje bi pêwîstiya beşdariya Herêma Kurdistanê û hemû pêkhatiyên Iraqê di vê projeya stratejîk de kir. Consulê Giştî yê Tirkiyeyê dilxweşiyê xwe ji bo wergirtina erkê xwe li Herêma Kurdistanê nîşan da û tekez kir ku welatê xwe dixwaze di hemû waran de peywendiyên xwe bi Herêma Kurdistanê re zêdetir bipêş bixe. Çareserkirina kêşeyên di navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta federalî de û hewlên ji bo destpêkirina hinardekirina petrola Herêma Kurdistanê, mijareke din e hevdişînek bû.

OHD'ê tîkildarî tecrîda Îmraliyê serî li Baroya Wanê da

OHD'ê tîkildarî tecrîda Îmraliyê serî li Wezareta Edeletê da. Piştî ku ti bersiv ji ser-



lêdanê re nehat dayîn, vê carê serî li Baroya Wanê da. Ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Hayrî Konar, Veysî Aktaş û Hamîlî Yildirim ên li Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê tîna ragirtin 39 meh in agahî nayê wergirtin. Tîkildarî tecrîda "mûtleq" a li Îmraliyê hezar û 300 parêzeran serî li Wezareta Dadê dabûn lê derbarê serlêdanê de hêj bersivê nehatiye dayîn. Li ser vê yekê 74 endamên Şaxa Komeleya Hiqûqnasên Ji bo Azadiyê (OHD) ya Wanê serî li Baroya Wanê dan.

Hevseroka Şaxa OHD'a Wanê Mehtap Işık a beriya serlêdanê axaftineke kurt kir, diyar kir ku ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û girtiyên din ên li Îmraliyê tîna ragirtin tu agahî nayên wergirtin û wiha got: "Ji bo ku em bi muwekilê xwe birêz Ocalan re hevdişînekê bikin di meha çileyê de ji 35 baroyan hezar û 300 parêzeran serî li Wezareta Dadê dan. Tevî ku bi ser serlêdanê re 6 meh derbasbûne jî wezarete hêj tu vegeer nekirine. Ji bo ku tecrîda li ser birêz Ocalan were rakirin û em bi muwekilê xwe re hevdişînekê bikin serî li Baroya Wanê didin." Işık, bal kişand ser çalakiya girtiyan a di çarçoveya "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pîrsgirêka kurd re çareserî" li girtîgehan didomînin û got: "Tecrîda li Îmraliyê dest pê kir belavî hemû girtîgehan bû. Em nizanin li girtîgehan çî diqewime."

Amacım: Kürdistanı Kurmak!

Mesut Barzani: Bağımsız Kürdistan'ın başkanı olmayacağıma söz veriyorum Amberin Zaman, referandum, Kürdistan'ın bağımsızlığı, Suriye'de ilan edilen federalizm, yolsuzlukla mücadele, Kürt birliği gibi gündemdeki önemli konuları Mesut Barzani'ye sordu.

AI-Monitor'da Amberin Zaman imzasıyla "Mesud Barzani Kürdistan Bölgesi'nin IŞİD karşıtı savaşta sergilediği aynı kararlılıkla yolsuzlukla mücadele edeceği sözünü veriyor" başlığıyla Kürdistan Bölgesi Başkanı Mesut Barzani ile yapılan bir söyleşi yayınlandı.

Tek amacını Kürdistan'ın bağımsızlığını gerçekleştirmek olarak ifade eden Başkan Barzani, Bağımsız Kürdistan'da başkanlık yapmayacağı sözünü verdi.

Referandumun ABD Başkanlık seçiminin yapılacağı 2016 Kasım ayından hemen önce Ekim ayında yapmayı planladıklarını dile getiren Başkan Barzani, Bağımsızlık ilanının engellenemeyeceğini, bu ilanın karşısında duranlarla yollarını ayıracıklarını vurguladı.

HDP'nin 7 Haziran seçimleri sonrasında Koalisyonda yer almayarak tarihi bir fırsatı kaçırdığını dile getiren Başkan Barzani, Barış sürecinin kesintiye uğramaması için ellerinden gelen tüm gayreti gösterdiklerini vurguladı.

AI-Monitor: Son zamanlarda geçmişten çok daha yüksek sesle bağımsızlık ve referandumu dilendiriyorsunuz. Bazı insanlar bu duruma şüpheyle bakıyor ve sizin dikkatleri ekonomik ve politik problemlerden uzaklaştırmak için böyle hareket ettiğinizi ileri sürüyorlar. Onlar sizin ciddiye ineniyorlar. Ciddi misiniz? Eğer ciddiyeniz bize referandum için bir tarih verecek misiniz? Referandumun konusu ne olacak?

Barzani: Milyonlarca insanın kaderini yakından ilgilendiren böyle bir kritik bir konuyu, yaşanan bunca acıdan, verilen bunca kurbandan sonra salt şahsi siyasi kariyerim uğruna araştıracığıma inanabiliyor musunuz? Bu karara, alternatif bir yol olmadıktan, uzun ve zorlu yıllarda edindiğim çok acı tecrübelerden sonra ulaştım. Soruyorum, bunun bir başka yolu var mıdır? Birlikte Bağdat ile ilişkilerimizi irdeleyelim. Kabaca iki dönem mevcut. 1992 ile 2003 arasındaki ilk dönemde 2.500 köyümüz yok edildi; 182.000 insanımız katledildi; 12.000 Kürdün akıbeti bilinmiyor; aşiretimden, Barzanilerden 8.000 insan öldürüldü. Halepçe'de 5.000 insan kimyasal gazlarla katledildi. Bu ilk dönemin ağır bilançosudur.

2003'te, tüm Iraklılara şiddet uygulayan rejimin devrilmesi mücadelesine katıldık ve tüm Iraklılara tam ve eşit haklar sağlayan yeni ve demokratik bir anayasa temelli yeni bir Irak'ta hep birlikte yaşamak için yola çıktık. Bu yeni anayasanın yazılmasına yardımcı olduk ve onun için oy kullandık. İyiniyet gösterdik ve iyi niyetle hareket ettik.

Irak'ın birliğinin anayasanın temel ilkesi olduğu anayasada açıkça belirtilmemektedir. Ancak Irak başbakanı birkaç kalem darbesiyle bunu sonlandırdı. Merkezi hükümet Kürtlerin bütçedeki payını dondurdu ve çok sayıda kritik konuda taahhütlerinin gereğini yerine getirmedi. Şimdi önümüzde iki seçenek var. Birincisi federalizmden vazgeçerek Irak'taki bir bölge haline gelmemiz anlamına gelen tüm haklarımızdan vazgeçmek, diğer seçenek ise referandum yoluyla halkımıza gitmek ve onların ne istediğini sormaktır. Açıkça mevcut statükonun sürdürülebilir yanı yoktur. Eğer her şey değişmeden devam ederse, geçmişin kanlı ve tahribat dolu dönemlerine dönüş yapacağız.

AI-Monitor: Peki insanlara soraçağın soru ne olacak?

Barzani: Bu henüz kesinleşmiş değil. Hala bunun üzerinde tartışmalarımız devam ediyor.

AI-Monitor: Seçenekler neler olacak?

Barzani: Sadece bir tek soru olacak.

AI-Monitor: Demek istediğiniz

insanlarınızın bağımsız bir Kürdistan isteyip istemeyeceği mi? Yoksa önerilen referandum Irak anayasasında öngörülen tartışmalı bölgelerde gerçekleştirilecek ve insanlara Irak'ın bir parçası olarak kalmaya devam etmek mi veya bağımsız Kürdistan'ın bir parçası olmak istedikleri mi sorulacak?

Barzani: Bu da sürecin bir parçasıdır.

AI-Monitor: Her iki ayrı soruyu da aynı referanduma koyabileceğinizi mi ifade ediyorsunuz?

Barzani: Henüz karar vermedik. Sorular birlikte yer alabilecekleri gibi ayrı ayrı da sorulabilir. Ama kesin olan bir referandumun yapılacağıdır.

AI-Monitor: Kesin olan referandumun bu yıl yapılacağı, değil mi?

Barzani: Kontrolümüz dışındaki koşulları engelleyebilirsek, bütün kalbimle Evet, referandumu bu yıl içinde yapmak istiyoruz diyebilirim

AI-Monitor: Peki aklınızda bir tarih var mı?

Barzani: Ekim ayını düşünüyoruz. [Kasım ayındaki ABD Başkanlık seçimleri öncesinde]

AI-Monitor: Uluslararası kamuoyu Kürdistan'ın bağımsızlığını ilan edebilmesi için komşu devletler Türkiye ve İran'dan en az birinin desteğini alabilmesinin şart olduğu konusunda hemfikir. Geçmiş yıllarda Türk dış politikasının önemli ölçüde lehinize değiştiğini gözlemledik. Türkiye Irak'tan ayrılan bağımsız bir Kürt devletini destekleyecek mi?

Barzani: Başlangıçta Türkiye Kürdistan Federalizmine de karşıydı. Oysa bugün yaşanan ilişkilere bakın. Referandum sadece Irak Kürdistan'ı ile alakalı olduğundan Türkiye'deki Kürtleri etkilemeyecektir. [Problem olmaması gerekiyor] Bu nedenle biz Türkiye'nin Kürdistan'ın ne istediğini kavrayacağını ve buna uygun davranacağını umuyoruz. Tabi biz Türkiye ile görüştüğümüz gibi eş zamanlı olarak Bağdat ve İran ile de görüşüyoruz. Bağımsızlığımızı barışçıl ve istikrarlı bir şekilde ilan etmek istiyoruz.

AI-Monitor: Bağımsızlık ilan ettiğinizde, Türkiye'nin mevcut hükümetinin bunu kabul edeceğine inanıyor musunuz?

Barzani: Eğer mevcut AK Parti hükümeti bağımsız Kürdistan'ı tanımaz ve kabul etmezse, Türkiye'deki diğer hükümetlerden hiç birinin kabul edeceğini sanmıyorum.

AI-Monitor: Recep Tayyip Erdoğan 2019 yılına kadar Türkiye'nin başkanı olacak. Bu manada siz ne olacaksınız o tarihe kadar olması gerektiğini mi belirtiyorsunuz?

Barzani: Ne demek istediniz?

AI-Monitor: Yani, bağımsızlığın ideal olarak bu tarih aralığında gerçekleşeceğini ifade ediyorsunuz, doğru mu?

Barzani: Erdoğan başbakan olduğunda Erbil'e geldi ve burada Kürtleri inkar döneminin sona erdiğini dile getirdi. Bu çok önemli bir gelişmeydi. Erdoğan'ı bir çok defa ziyaret ettim ve Erdoğan'ın Kürt sorununa bir çözümün çok daha iyi anladığını gözlemledim. Erdoğan'dan duyduğumu daha önce hiç kimseden duymadım.

AI-Monitor: Ancak Türkiye kendi Kürtleriyle çok büyük sorunlar yaşıyor ve durum gittikçe kötüleşiyor. Buna göre Türkiye bu problemi çözmedikçe, Türkiye bağımsızlığınızı desteklese dahi, bu destek sağlıklı bir temelde olmayacaktır.

Barzani: Barış sürecinin durmasını arzuladık ve barış sürecini korumak için elimizden gelen tüm gayret gösterdik. Ayrıntılara girmek istemiyorum, ama 7 Haziran 2015 seçimlerinden sonra Halkın Demokrasi Partisi (HDP) parlamentoda 80 koltuk kazandığı zaman yaptığımız bir açıklamada HDP'nin AKP ile birlikte bir koalisyon hükümetinde yer almamasının tarihi bir hata olacağını dile getirdik. O esnada,

AKP'nin, HDP'nin koalisyon hükümetinde yer almasını istemediğini düşündüm, ancak sonra HDP içindeki insanlardan koalisyonda yer almak istemeyenin asıl HDP olduğunu öğrendim. Bunun büyük bir hata olduğunu düşünüyorum.

AI-Monitor: Çünkü onlar Erdoğan'ın bir "sultan" olmasını desteklemek istememiş olamazlar mı?

Barzani: Sultan çağı geride kaldı. Aksine, koalisyonunda yer almış olsalardı, kendilerini ilgilendiren konularla ilgili söz söyleme hakları doğacaktı. Parlamentoda değişiklikler yapmak için mücadele etme şansına



şahip olduklarını düşünüyorum, bunu değerlendirmeleri gerekirdi. Şimdi çok endişeliyim ve korkuyorum. Şehirlerde belirsiz terörist örgütler adına bombalamalar, şiddet eylemleri gerçekleştiği zaman Türk halkı bütün Kürtleri sorumlu tutacaktır. Bu durumun Kürt ve Türk halkı arasında bir etnik çatışmaya dönüşmesinden endişe duyuyorum.

AI-Monitor: Öyle görünüyor ki, PKK'ye karşı, belki Şengal'de daha fazla etkinlik göstermeniz için Türkiye'den çok daha fazla baskı gelecek. Bu baskıyı hissediyor musunuz?

Barzani: Hayır, bizim kendi gündemimiz var.

AI-Monitor: Ama, Kürdistan İstihbarat şefi olan oğlunuz Masrur Barzani'den PKK'nin Şengal'i terketmesi gerektiğini bizzat kendi kulaklarımla duydum.

Barzani: Kesinlikle, PKK Şengal'i terketmelidir. Biz, onların Şengal'i zorla değil, barışçıl bir şekilde terk etmelerini istiyoruz.

AI-Monitor: Peki Amerikalılar bu konuda sizin adınıza müdahale ettiler mi?

Barzani: Amerikalılar yerli sorunlara dahil olmazlar. Ama Amerikalılar Şengal'deki PKK varlığının bir anlam ifade etmediğini biliyorlar.

AI-Monitor: Federal Kuzey Suriye deklarasyonunu nasıl değerlendiriyorsunuz?

Barzani: Federalizm konseptinin Suriye'deki statüye uygun olduğunu düşünüyorum. Ancak bu konuda Suriyeliler kendi aralarında bir konsensus oluşturmazlar. Biz Kürdistan bölgesinde federalizm ilan ettiğimizde bunu tek taraflı olarak yaptık.

AI-Monitor: Bu deklarasyonun arkasındaki itici güç olan Demokratik Toplum Partisi (PYD), deklarasyonun diğer demokrasiye ve diğer gruplara saygı konusunda kararlı olduğunu belirtti.

Barzani: PYD, sahadaki uygulamaları göz önüne alındığında demokrasi konusunda samimi görünmüyor.

AI-Monitor: Suriyeli Kürt Halk Savunma Güçleri [PYD'nin askeri kanadı] ile Amerikalılar arasında git-tikçe gelişen askeri ve belki de siyasi bağlantılar konusunda ne düşünüyorsunuz?

Barzani: PYD'ye yapılan destekler PKK'ye yapılmış anlamına gelir.

AI-Monitor: PYD ile PKK'nin aynı olduğuna inanıyor musunuz?

Barzani: Onlar kesinlikle bir ve aydırlar.

AI-Monitor: Amerikalılar buna inanıyor mu?

Barzani: Elbette onlar da bunu çok iyi biliyor, ama bunu bildiklerini

ifade etmek istemiyorlar... Bildiğiniz gibi Amerikalılar ve bizim için en önemli öncelik IŞİD'e karşı savaştır, bu nedenle görmezden geliyorlar

AI-Monitor: Biraz da IŞİD karşıtı savaşı konuşalım. Musul'un bağımsızlıktan önce kurtarılacağına inanıyor musunuz?

Barzani: Musul ile Kürdistan'ın bağımsızlığı konusunda bir ilişki yok.

AI-Monitor: Öyle demek istediğim? Bağımsız olduğunuzda IŞİD hala Musul'da olabilir mi?

Barzani: Neden olmasın?

AI-Monitor: Tehlikeli komşu.

Barzani: Kürtler belalı komşularla

başkanı olmayacağıma dair söz veriyorum.

AI-Monitor: Gerçekten?

Barzani: Evet. Amacım bağımsız bir Kürdistan'ı kurmaktır, onun başkanı olarak kalmak değil.

AI-Monitor: Planlarınız, petrol/enerji zenginliğinin ülkenizi finans etmesi fikrine dayanıyor. Petrol fiyatları dibe vurdu. Türk Başkonsolosu Aydın Selcen, Türkiye'nin Irak Kürdistan'ında üretilen tüm varlıkların hisselerini satın alması ve yaklaşık 8 milyar dolarlık bir doğal gaz boru hattı döşenmesi önerisinde bulundu. Bu iyi bir formül mü? Bunu Türk hükümetiyle tartışabiliyor musunuz?

Barzani: Gerçekten, ayrıntılara girmek istemiyorum. Ekonomi ve petrol konusundaki bu ayrıntılı sorunun doğru adresi, onların sorumluluğunda olduğundan, bakanlar kuruludur.

AI-Monitor: Ama, yapılan enerji anlaşmalarının yöntemi ve yeterince şeffaf olmaması ile ilgili genel eleştiriler var.

Barzani: Eksiklikler olabilir, ama ayrıntılı bilgiye sahip değilim. Bu nedenle en iyisi kurula sormanız. AI-Monitor: YNK'li bir heyet Ankara'ya giderek petrol konusunda görüşmelerde bulunacak

Barzani: Gaz tüm Kürdistan halkına aittir. Bu konu politik partilerin değil, Kürdistan Bölgesi Hükümeti'nin sorumluluğundadır. Petrol ve doğal gaz Kürdistan Bölgesi Hükümeti'nin işidir, YNK'nin değil.

AI-Monitor: Bu zor zamanlarda rüşvet ve yolsuzluk sorunu çok daha fazla konuşulmaya başladı. Yolsuzluğu bastırma için planınız nedir? Yüksek rütbelere veya mevkilere sahip olsalar dahi suçluları cezalandırmak yoluyla caydırıcı olmaya hazır mısınız?

Barzani: Dün yargı kurumlarının şeflerinin katıldığı çok önemli bir toplantıya katıldım. Bunlar finansal reformları uygulamaktan sorumlu olan kurumlardır.

AI-Monitor: O halde kısa süre içinde bazı tutuklamalar veya adli soruşturmalar görülebilir miyiz?

Barzani: Onlara sadece bir şey söyleydim. Kimse dokunulmaz değildir. Eğer benimle ilgili bir şey bulursanız, beni çağırın. Mahkemeye geleceğim. Neçirvan [Başbakan, Mesut Barzani'nin yeğeni] mahkemeye gelmek zorundadır. Masrur [Mesut Barzani'nin oğlu] ile ilgili bir şüphe varsa mahkemeye gelmek zorundadır. Evvela benim ailemden başlamak zorundayız, daha sonra Kürdistan Demokratik Parti (PDK) ve ondan sonra da diğer politik partiler. Böylelikle, görevini istismar eden, kötüye kullanılan kim olursa olsun, bu kurumlara tüm gücümle arkalarında olduğumu söyledim. Resmi olarak yolsuzluklarla mücadele eden sorumlusunuz. Bu nedenle bununla mücadele etmenizi istiyorum. Ama eğer görevinizi yapmazsanız, o halde sizi devre dışı bırakarak bu mücadeleyi ben şahsen sürdüreceğim. Ancak o takdirde Kürdistan'da hukuğu devre dışı bıraktığım için beni suçlamayın. Çünkü yolsuzlukla mücadele ve sahip oldukları resmi pozisyonlarını petrol anlaşmaları, tarım arazilerinin satışı ve bunun gibi şeyler için kötüye kullanan kişilerle mücadele bizim için çok önemlidir. İçişleri Bakanlığı, Peşmerge Bakanlığı, Başbakan, herhangi bir bakan, bir parti lideri, bir güvenlik yetkilisi sorumluluğu ne olursa olsun yaşananlardan sorumlu olmak zorundadırlar.

AI-Monitor: Çok sayıda genç insanla konuştum ve hepsi yolsuzluklardan şikayetçiler.

Barzani: Bizim için, yolsuzlukla mücadele varoluşsal bir sorundur. Bu nedenle, nasıl ki büyük bir motivasyon ve tüm güçlerimizle IŞİD'e karşı savaştıysak yolsuzluklarla da aynı kararlılıkla mücadele edeceğim. Bağımsız Kürdistan'ın

AI-Monitor: Bir diğer problem ise Kürtler arasındaki birlik eksikliği.

Barzani: Kürdistan Yurtseverler Birliği (YNK) ile ciddi bir ortaklığımız var ve diğer partilerle de olmaya çalışıyoruz. Gorran yıkıcı bir rol oynadılar ve kendi kendilerini konu dışı bıraktılar.

AI-Monitor: Bağımsızlığı hedefleyen biri olarak bir yol haritanız var mı?

Barzani: Evet, kesinlikle. Parlametoyu yeni bir parlamento sözcüsü seçimleriyle yeniden aktifleştireceğiz. Kürdistan'ın bağımsızlığı parlamentodan ve politik partilerden daha önemlidir. Her kim, bu bağımsızlığın bir parçası olmak isterse memnuniyetle karşılanır ve her kim bunun karşısında durursa ayrılmak ve kendine yeni bir yön çizmek zorundadır.

AI-Monitor: Peki bu kritik dönemde başkan olarak kalmanız gerektiğini düşünüyor musunuz?

Barzani: Amacım bu noktaya, bağımsız bir Kürdistan'a ulaşmak. Bu benim için bir şereftir. Bağımsız Kürdistan'ın gerçekleştirdiğimiz gün, Kürdistan'ın başkanlığından ayrılacağım. Ve Kürdistan halkını kutlayarak bu görevimi yerimi alacak kişiye devre-deceğim. Bağımsız Kürdistan'ın

kurdistanaktuel.com

Dr. Ekrem Onen: Konslosê Rûsya Qeyserî li Mahabadê

Aleksander İvanoviç İyas
15.09.1869 – XX.XX.1914

Werger ji Rusî: Dr Ekrem Onen

Aleksander İvanoviç İyas
Evserê alaya Litva a parazti-
na Qeyserê Rûsî bû – Лейб-
гвардейского Литовского полка
(Leibgarde. E.Ö)

Di sala 1901 de hate persiya
û li bajarekî biçûk Tybete – Hey-
derî ku ne durî hudûdê Afgan-
istanê kar kir.

Xwendina xwe ya Rohjilat-
nasîyê di salên 1895-1898 di

barê rewşa siyasî a li Xorosanê û
Bakurê Afganistanê ku ji erkana
eskerî a herêma Turkîstanê re rê
kirîye gelek bilind tîn nirxandin.
Ew ji ji ber, hema bêje wek
yekemîn kes bû zimanê Afganî
zanî bû her weh monopolîya
zanebûna zimanê Kurdî bû.
Heman demê de zanakî zimanê
Farisî bû ,ne bes di peyivî her
weha bê qusûr dinivîsî.

Di dema karê xweyî li Persiya
ji Nêzikde nasbûna wî û Rohjilat-
nasê Rûsî yê nevda (Kurdolog
.E.Ö) V. F. Mînorskî re ku karê

Kurdistana Persiya xebitiye, her
weha li ser pîrsa nakokîya sînorê
navbera Persiya û Turkî xebat
kirîye.

Di sala 1913 de bi kaptanê
erkana navendî Karaûlov re sefer-
ekê ber bi navça bakurê hudûdê
persiya dikin ji bo bi cihkirina
hudûdê navbera Persiya û Turkî,
Her weha ji bo di derheqê eşîrê
kurdan de infoemasyonê bide hev.
Di encamê keşivê da gelek
agahiyên heja yê siyasî, eskerî-
coxraffî û etnografî bi dest dixin.
Gelek ji van agahîyan İyas di xeba-
ta xwe ya ” seferê bakurê Kurdis-
tana Persiya” de bi cih kirîye.

Aleksander İvanoviç İyas xwe
bi çend foto kamera amade kiribû
ku yek ji wan jî “Kodak Panorama”
ji bo ku bi karibe resmên panora-
ma bikşîne. İyas lazim bû kontrola
karwanê ticaretê ku ji Hindistana
Brîtanya dihat ku nehêle di rêya
wande nexweşîya veba – Bûbon
(Vîrus înfamasyon) derbasî nava
Rûsya bibe. Lê Brîtanî bawer bûn
ku Efser wek ajaneke eskerî illegal
hatîye şandin.

Di dirêjaya xizmeta xwe ya li
Persiya, İyas her berdeyam bû bi
kişandina resmên ciwan yê
waran, mirovan û buyaran ku ew
rastî wan dihat. Bi xêra wî îroj em
bi nerînek nadir ya Rûsî em fam
dikin wê serdemê İnan çawa bû.

Aleksander İvanoviç İyas her
weha lîngvîst bû û zimanê Farisî,
Turkî û Kurdî baş zanî bû.

Di resmên wî de niştecîyên
herêmê pir tabîne û pir ferqin, ji
resmên wê demê ku adet bû wek
stîla “rojhilatnasîyê” ya huner-
menda.

Aleksander İvanoviç İyas di
şerê pêşîn yê cephê Røjhilata



nêzik yê şerê cihanê yî yekemîn
de hate kuştin. Lê bi xêra li
hevhatineke tesaduf negatîvên
wî (hinek ji wan di nav alavên
efserekî Turk ku di şerê li dora
Tebrize ku di sala 1915 de hatibû
kuştin derketin) hatin xelas kirin
û van nêzikna ji raya giştîre hate
nîşan dan. Vekirina Koleksiyona
resmên Persiya a 1901 – 1914 a
Aleksander İvanoviç İyas, îmkân
da ku em arşîvek heja û întesnt
ku aspektên cuda yê tarîxa civakî
a bakurê rojavayê İnanê, her
weha bi dokumentên grînge ji bo
serdema bûyerên gring di tarîxa
welat da nas bikin.

Kartateka !

Lutheriste. Xwendina xwe ya
teyayî û eskerî li beşê kadetê ya
Fîndîliya xwendîye. Wek Letî-
nantê 2 (efser) li Лейб-гвардей-
ского Литовского полка (Leib-
garde. Alaya Litva.E.Ö) dest bi
kar kirîye.(05.06.1889) Bû Letî-
nant.(05.08.1895). Kursên
zimanê Røjhilat li beşê xwendinê
yê departementa Asîya ya MİD
(wezareta derve a Rûsya).
(1895-1898). Wek serokê herê-

ma pişt kaspîya hat tayin kirin.
Gelek caran bi serdanên kar diçû
herêmên Persiya. Kaptanê
erkane (06.05.1900). Kaptan
(05.08.1903). Li konsulxana
navendî a Meşxede kar kir.
Polkovnik (Albay) (06.12.1912).
Cîgirê konsul li bajarê Soudjbu-
lakê (Azerbeycana Persiya). Di
sala 1914-1915 de ji alî Turkê
derbasî nav axa İnanê bûbûn
hate kuştin.

Xelatên Ana 3 (1905) û xelata
stanislawê 2 (1909) de wergirtîye.

P.S.

Ez bawerim koleksiyona
A.İ.İyas wê gelek dewlemend be
di pîrsa kurdan de. Ev dokument
min ji arşîva eskerî ya Rûsya
Qeyserî derxistîye

li ser kartateka li cihêkî tenê
Soudjbulak wek (Azerbeycana
Persiya) hatîye nivîsandin. Wek ez
fam dikim yê kartateka hazir
kirîye ev şaşîti kirî ye. Lê min wek
orîgînalê wergerandîye ji ber
dokument nabe mirov
